Şerîf Hejarî:

Hin ji hêzên kurdî, bûne kopalê destê Îranê û fermanên wê cîbicî dikin.

»»» R:5

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (324) 20-04-2018 Buha (1000) Tûmen

Xelkê Îranê çima nerazî ne?

»»» R:4

N: Mistefa Hicrî

Meş û rabûna xelkê Îranê li dijî rejîmê di meha Befranbara sala borî de, bi awayekî giştî gihîşte nêzî sed bajaran. Aliyê herî kêm yê xisara vê rabûnê bo xelkê Îranê, destbiserkirin û girtina bi hezaran kesî û kuştina 25 kesan (li gora gotina berpirsên rejîmê) di encama serkutkirina xelkê meşvan ji aliyê hêzên serkutker ên Komara Îslamî a Îranê ve, û kuştina pênc kesên girtî li jêr îşkenceya di girtîgehan de bûye.

Lê nirxa van meşên xelkî bo rejîmê di biyavê siyasî, çandî, û civakî di navxwe û derve de girantir ji vê bû ku bê cubrankirin. Armanca vê nivîsê baskirina ji çawanî û nirxandina van xisaran nine, jiber ku eva behseke dirêj, û gotarên din dixwaze, lê armanca nivîskarê vê nivîsê baskirina ji bersivandina vê pirsê ye ku "Xelkê Îranê çima nerazî ne?".

Rasana aram ya bajar

Ji roja Yekşemî 26`ê Xakelêweyê şûnda bazariyên bajarên sînorî ên Kurdistanê, wate Bane û Ciwanroyê, bona nîşandana nerazîbûna xwe li hemberî daxistina bazarçeyên sînorî û zêdekirina nirxa gumrikan ku wekî çalakên siyasî dibêjin, pêk tê jî siyaseta qirkirina gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê, dest dane girevê, û di heyama çend rojan de, ew girevgirtin berfireh bûn, û heft bajarên Kurdistanê bi xwe ve girtin. Li piraniya van girevan de, bi awayê sembolîk û wekî gazindeya li hember siyaseta qirkirina xelkê hejar di Kurdistanê de, girevgirtiyan sifreya betall raxistin, û rage-handin: "Sifreya betall ya me nan dixwaze".

Eva çend meh in ku bi biryareke rejîmê, sînorên kolberiyê ên di navbera Başûr û Rojhilata Kurdistanê ku çavkaniya bijîwa sedan hezar kasibkar û dukandar û kolberên bajarên sînorî ye, hatin daxistin, û ew yek jî bûye sedema bêkariya zêdetir ya xelkê.

Heya dariştina vê nûçeyê, gireva kasibkarên heft bajarên Rojhilata Kurdistanê wate Ciwanro, Bane, Merîwan, Seqiz, Serdeşt, Pîranşar û Mehabadê berdewam e.

Êvariya roja Çarşemiyê 29`ê Xakelêweyê Se`îd Celîlî nûnerê rejîmê li şêvra Bilind ya Ewlehiya Neteweyî, bona bidawîanîna gireva dukandar û bazariyan, serdana bajarên girevgirtî kir, û di dema axavtina xwe di bajarê Bane de, bi sedema nerazînîşandana girevgirtiyan, nekarî axavtina xwe bi dawî bîne.

Her di vê derheqê de fermandarê bajarê Bane, qewl û soza cîbicîkirina kêşeyên bazariyan dabû, lê xelkê bawerî bi qewlên navbirî nekirin.

Her di vê derheqê de Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê jî daxuyaniyek weşand ku di beşeke wê daxuyaniyê de hatibû:

"Em piştevaniyê ji girevgirtin û nerazînîşandana bajarên sînorî dikin.

Eva çend roj in ku girevgirtin û nerazîbûna xelkê bajarên sînorî ên Kurdistanê li dijî daxistina sînoran, dirêjî heye. Ew nerazînîşandanên medenî bi awayê kombûna li ber deriyê fermandariyên bajarên Ciwanro,Bane, Merîwan, û Seqizê, û herwisa bi awayê raxistina sifreya betall û kombûna li dewra vê sifreyê xwe nîşan daye. Vê hereketa medenî bajarên Serdeşt û Pîranşarê jî bi xwe ve girtiye, û tê çaverêkirin ku veguhêze bajarên din jî, û herwisa dom hebe.

Eşkere ye ku jiyana hejmareke zaf ji rûniştiyên zehmetkêş ên bajar û navçeyên sînorî ji riya kolberiyê ve bi rê ve diçe. Rejîma Îslamiya Îranê li jêr navê xebata li dijî hatina alavên qaçax de, sal bi salê tundûtîjî û tawan û zordarî li dijî kolberan zêdetir kirine. Serbarê kuştin û birîndarkirina bi sedan kolberî û detsbiserdegirtina barên wan, û jinavbirina çarpiyên ku bar tînin û dibin,berdewam hewla tunekirina vê tenê çavkaniya jiyan û dahata bi dehan hezar malbatên desteng ên van navçeyan daye".

Herwisa di beşeke din de hatiye:

"Niha jî tevî daxistina ser ji

»»» R:8

Sergotar

Nan, Azadî, Kerameta mirovî

N: Kerîm Perwîzî

Mirovek ku di hejariyê de hatiye ragirtin, mirovek ku haşayê ji nasnameya etnîkî, ayînî, yan neteweyî ya wî/wê tê kirin, yan dikeve ber zexta siyaseta helandin û sivikatîpêkirin, yan li jêr stema zayendî de dijî, mirovek e ku kerameta wî/ê jê hatiye zewtkirin.

Eva hevokek e nava bername û pêreva navxwe ya PDKÎ ye, ku li beşa bingehên hizrî û siyasî ên hizbê de hatiye, û di van rojan de, bi rohnî em rengvedana kiryareke weha ya dijîmirovî di Komara Îslamî de dibînin.

Rejîma Îslamî li Tehranê, li ser bingeha sivikatiya bi mirov hatiye avakirin, û di çarçoveya îdeolojîk ya qorixxwazane de siyaset kiriye, û kiryar ji xwe nîşan daye, ku mirov di hizra wê de jîndareke bêhêz û bêawez û bêvîn e, ku hewce ye wekî ajel heya ku dikare mifahê jê wergire, û her wekî ajel her demekê bêxeberî kir, bide ber qamçiyan.
Ji vê dîtingeha dijîmirovî ya Komara Îslamî ve, her çi ji navenda îdeolojîk ya deshilata têkel bi şovînîzmê dûrtir dikevî, ajeltir têy ber çav.

Tenê mirov ji vê dîtingehê ve Weliyê Feqîh e, û ewên ku hinek ji Weliyê Feqîh nêzîk in, rengê mirovan didin!. Xeyrî fars, hejar, kêmdahat, jin, xeyrî Şî`eyê wilayeta feqîhî, ji dîtingeha Weliyê Feqîh ve zêdetir wekî nemirovan çav lê tê kirin.

Çar dehikan deshilata Komara Îslamî tejî bûye ji sivikatî bi neteweyên xeyrî Fars, û tejî bûye ji çewsandina mirov bi destê mirov, tejî bûye ji dizî û talankirina serwet û samana welat, û baca terorîzmê û serberedayiyên wan jî, sifreya nanê hişk ê çîna kêmdahat û hejar bûye, û seranên rejîmê li Kanada û Swîsê û Birîtanya û Îspaniya û Alman vîla û pişka hotêlan kirîne.

Stema li dijî jinan, li dijî cudabîran, li dijî neteweyên xeyrî fars,li dijî ayînên xeyrî şî`e ên Wilayeta Feqîhî, û li dijî hemû mirovekê ku xwe pê

xwedî nasname û kesayetiyek bûbe, di heyama vê deshilatdariya pirr tawane de bi rê ve çûye.
Encama vê deshilatê sivikatî bi kerameta hemû mirovan di panahiya erdnîgariya welateke bellalêdayî bi navê Îranê de bûye, û ew rejîm bi perê neftê û bazerganiya digel bazerganên xwînê li Ewropa, Kanada, Amerîka, Rûsiye, çîn, û...hwd nirxa hêza hov ya Spaha Pasdaran dabîn dike, û xelkê pê serkut dike.

Di sîstemeke weha de ye ku xelk li Qum û Îsfehanê dirêjin ser şeqaman û wêneyên Xamineyî dişewitînin! Di Tehranê de jî derwêş digel deshilata Xamineyî berbirû dibin, û jinên mandî ji hemû stemekê, xavika (leçka) stemkariyê ji serê xwe radikin, û pêpikên deshilata Wilayeta Feqîhî pê dihejînin.

Her di encama sîstemeke weha de ye, ku bajarên wekî Bane û Ciwanro û Serdeşt û Pîranşar ku heya duh wekî cemsera bazerganiyê dihatin binavkirin, niha bi sedan kesî tînin ser kolanan û sifreya betall ya mala xwe nîşan didin.

Rejîmek û sîstemek ku sivikatiyê bi kerameta mirovan dike, îca çi bi ragirtina di hejariyê de, yan jî bi haşakirina ji nasnameya neteweyî ya wan, yan stema zayendî û ayînî, sîstemek nine ku bikare xweşî û jiyana rehet ji xelkê re bi diyarî bîne, û hemû ewên ku kerameta wa sivikatî pê hatiye kirin, dijî wê radibin serpiyan, û koşka rizî ya dehilata wehmî ya wê dişewitînin.

Şandeke Komela Zehmetkêşan a Kurdistanê, serdana PDKÎ kir

Şandeke Komela Zehmetkêşan a Kurdistanê, bi serperestiya "Riza Ke`ibî" serdana PDKÎ kir.

Roja Yekşemî 28`ê Xakelêweyê, şandeke Komela Zehmetkêşan a Kurdistanê, bi serperestiya "Riza Ke`ibî" cihgirê sekreterê giştî yê Komela Zehmetkêşan a Kurdistanê, serdanî PDKÎ kir, û ji aliyê heyeteke PDKÎ bi serperestiya "Mistefa Hicrî", lêpirsyarê giştî yê PDKÎ û hejmarek ji endamên rêberiyê ve pêşwazî jê hate kirin.

Di destpêkê de, "Riza Ke`ibî" tevî pîrozbahîgotin ji ber tewawbûna kongireya16.`mîn a PDKÎ ya naskirî bi "Kongireya Rasana Rojhilat" û hilbijartina lêpirsyarê giştî yê hizbê, herwisa hewcehiya zêdetir li yek nêzîkbûna partiyên siyasî yên Kurdistanê girîng da zanîn.

Piştre "Mistefa Hicrî" tevî spas ji ber pîrozbahî gotina navbirî, herwisa derheqê bihêztirkirina Navenda Hevkariyê, û yekbûn û yekdengiya hêzên siyasî yên Rojhilat û rewşa nebaş a rejîmê, herwisa dîtingeha PDKÎ jî anî ber bas.
Her di vê civînê de, derheqê rewşa Kurd di parçên din yên Kurdistan de, û herwisa pirsgirêkên pêşiya doza Kurd, guherîna bîr û boçûnan kirin, û herwisa hewcehiya wan civînan û hevdîtinan girîng dane zanîn.

www.sivakurd.org

Şandeke Partiya Azadî a Kurdistanê serdana PDKÎ kir

Şandeke Partiya Azadî a Kurdistanê, bi serperestiya "Mistefa Ozçelîk" serdana PDKÎ kir.

Roja Yekşemî 28`ê Xakelêweyê, şandeke Partiya Azadî a Kurdistanê, bi serperestiya "Mistefa Ozçelîk", serokê giştî yê vê partiyê serdana PDKÎ kir, û ji aliyê heyeteke PDKÎ bi serperestiya "Mistefa Hicrî", lêpirsyarê giştî yê PDKÎ, û hejmarek ji endamên rêberiyê ve pêşwazî ji wan hate kirin.
Di destpêkê de, "Ozçelîk", tevî pîrozbahîgotinê jiber tewawbûna kongireya 16.mîn a PDKÎ û hilbijartina lêpirsyarê giştî yê hizbê, weke hemî deman derheqê berfirehkirina pêwendiyên dîrokî û dostane yên di navbera wan û PDKÎ de pêdagîrî kir, û herwisa bandor û rola PDKÎ di Kurdistana Rojhilat de bilind nirxand.

Piştre "Mistefa Hicrî", tevî spaskirin jibar pîrozbahîgotina navbirî, derheqê rewşa nebaş a rejîmê di warê giranî, betalî, kêmbûna buhaya Tûmen, nerazîbûnên xelkê, xemsariya rejîmê, siyasetên destêverdanên rejîmê di deverê de, û tevdanîkariyên vê rejîmê û herwisa dîtingeha PDKÎ axivî.

Her di vê civînê de, derheqê rewşa Kurd di Bakûrê Kurdistanê, û herwisa parçên din yên Kurdistan de, û herwisa astengî û pirsgirêkên din yên pêşiya doza Kurd de guherînên bîr û boçûnan kirin.

Desteyek din ji pêşmergeyan kincê pîroz ê pêşmergatiyê li xwe kirin

Desteyek ji keç û xurtên şoreşger yên Kurdistan a Rojhilat, piştî derbazkirina devra destpêkî a pêşmerge di çiyayên Kurdistanê de, kincên pîroz yên pêşmerge lixwe kirin.

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê, di çiyayê Kurdistan de ragehand ku: Roja Pêncşemî 23`ê Xakelêweya 1397`an, devra 229 ya destpêkî a pêşmerge di çiyayên Kurdistan de bi rê ve çû, û di vê rêûresma taybet de, desteyek ji ciwanên şoreşger û lêhatî yên Kurdistan a Rojhilat tevlî rêzên hêzên pêşmerge bûn, û çeka beravîkirin ji ax û şerefa xwe li milê xwe kirin.

Ev rêûresma bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb", û ragirtina deqeyek bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha pak a şehîdên Kurdistan destpêkir. Piştre" Seyîd Ezîz Nîkcûyan" yek ji fermanderên leşkerî yên PDKÎ, bi boneya dawyî hatina devra destpêkî a 229 ya pêşmerge axvî.

Nîkcûyan di axavtina xwe de, bas ji vê kir ku, Di qata têkoşîn û xebatê de, hewceye hemû hevbîr an û hevçeper, bi rengekî dilsozane piştevanê yektir bin ji bo pêgehandin û haydar kirina yektir, û herwisa hevlbidin da ku rojbiroj îrade û îmana pêşmerge û endamên hizbê ji bo dirêje dan bi xebatê qahîmtir bikin.

Di beşek din a vê rêûresmê de, helbestek li jêr navê "Şengesewar", ji aliyê mamosta "Şerîf Felah" ve hate xwend in.

Di beşeke din de, rapora perwerdkirina devrê ji aliyê "Hîwa Mîrzayî" yek ji mamostayên perwerdê ve hate xwend in, û herwisa kar û çalakiyên devrê ji kesên beşdar re hate xwendin.

Di nav bernameyê de, sirûda bi navê "Gel xebat dikin" ji aliyê kesên beşdarên vê devrê hate xwend in.
Herwisa di beşeke din a vê rêûresmê de, peyama devra 229 ya destpêkî ya pêşmerge, ji aliyê yek ji pêşmergên beşdar ên vê devrê yê bi navê "Kurdyar Kerîmî" ve hate xwend in.
Herwisa di dawiya vê rêûresmê de, helbesta ku "Dr.Awat Saroc" çêkirinbû, ji aliyê "Ferşîd Îslamî" ve hate xwend in.

Piştre du stranên şorevanî ji aliyê beşdarên devrê ve pêşkêşî beşdaran hate kirin.

Herwisa ev rêûresm bi nimayêşên taybet ên nizamî ku ji aliyê kesên beşdar yên di vê devrê ve hatibû amade kirin dawî pê hat.

www.arsivakurd.org

Xelkê Îranê çima nerazî ne?

N: Mistefa Hicrî

Meş û rabûna xelkê Îranê li dijî rejîmê di meha Befranbara sala borî de, bi awayekî giştî gihîşte nêzî sed bajaran. Aliyê herî kêm yê xisara vê rabûnê bo xelkê Îranê, destbiserkirin û girtina bi hezaran kesî û kuştina 25 kesan (li gora gotina berpirsên rejîmê) di encama serkutkirina xelkê meşvan ji aliyê hêzên serkutker ên Komara Îslamî a Îranê ve, û kuştina pênc kesên girtî li jêr îşkenceya di girtîgehan de bûye.

Lê nirxa van meşên xelkî bo rejîmê di biyavê siyasî, çandî, û civakî di navxwe û derve de girantir ji vê bû ku bê cubrankirin. Armanca vê nivîsê baskirina ji çawanî û nirxandina van xisaran nine, jiber ku eva behseke dirêj, û gotarên din dixwaze, lê armanca nivîskarê vê nivîsê baskirina ji bersivandina vê pirsê ye ku "Xelkê Îranê çima nerazî ne?".

Bersivandina rast ya vê pirsê di vî warî de girîng e, ku seranên rejîmê û kirêgirtiyên rengbireng ên wan, bizanebûn û bi armanca kêmnirx nîşandana vê rabûnê, herwekî derbazbûyî hewl dane ku bîrûraya giştî bixapînin, û girûpeke din jî nebizanebûn û li jêr bandora pêla berfireh ya piropagendeyên rejîmê ku ji riya hezaran tirîbonên mizgevtan, kanalên televîzyonî, radyo, rojname û navendên fikrî û teblîxî ên rejîmê ku bombebarana hizrî ya xelkê dikin, bi awayekî din di rastaya armancên rejîmê pêngavan hildigrin, eva di demekê de ye ku tu ragehandineke azad û serbixwe di vî welatî de tuneye, ku di hemberî van pêlên bihêz de, xelkê digel bersiva rastîn ya vê pirsê nasyar bike.

Rejîmê hemû şiyana maşîna piropagendeya xwe bi kar anîye, da ku bikarin pirsa rabûna giştî ya xelkê nerazî di meha Befranbarê de, ku heta niha di formên curbicur de (Gireva kedkaran, karsazan û bi taybetî meşa xelkê Ereb ê Ehwazê) dom hebûye, di biyavê aborî de berteng bike, û bi vî rengî biyavên din ên sedemên nerazîbûnan ku giştgîrtir ji biyavê aborî ne, veşêrin.

Ew rejîm her ji rojên destpêka hatina bo ser deshilatê hemû hewla xwe da, ku ji Îranê dojehekê bo xelkê xwe çê bike, ku bîrjêkirina wê jî zehmet bû, û elheq hewl û bernameyên wê jî di doma çil salên borî de, di biyavê guherîna Îranê bi cehnemê tewaw serkevtî bûye. Yek ji bernameyan wêrankirina aboriya Îranê bû. Darêtina bi hûrî ya siyasetên navxweyî û hevahengkirina siyasetên derveyî ji bo çêkirina dijminan û mezaxtina dahatên berfireh ên welat di rastaya sergirtina îdeolojiya pozbilindane (bilindfirane) ya zêdexwaziyên xwe, bona gihîştina bi rêberatiya cîhana Îslamê cuda ji gendeliya hevsarberedayî ya hikûmetî karî ku xelkê ji nanê ser sivka xwe jî bêpar bike. Rejîm di pêşvebirina vê siyaseta aborî de li pey vê armancê bû ku nanê xelkê jî di nava lepên xwe de hebe, da ku bi vî rengî hemû ewên ku digel siyasetên rejîmê nînin bitirsîne, û gefa qutkirina nanê wan bixwe, û ji vê riyê ve hêza xwe ya serkutker di navxwe û hêzên dagîrker û destêwerder di derveyî welat de li jêr navên wekî Spaha Pasdaran, besîc, û ...hwd roj bi rojê berfirehtir bike, jiber ku di "Umulqera ya Îslamî" ya Îranê de, ew tex ne tenê destên wan nagihîje devên wan, belku di talankirina malên gistî, gendelî, û rantxwariyê de serbest û azad hêlane. Ew aboriya wêran ku rejîm wê wekî aboriya Îslamî! bi nav dike, tenê beşek ji kêşeya xelkê Îranê ye, ku rojane digel wê de serûkar hene, û her rojê bi aloziya wê ve zêde dibe.
Ji bilî kêşeya aborî, vê rejîmê bi hezaran kêşeyên din jî bo xelkê afirandiye, ku her yek ji wan kêmnirxtir ji kêşeya aborî ji bo wan nînin, bi awayekî ku bingeha civaka Îranê tevlihev kirine.

Kêşeyeke din berfirehkirina îtiyadê wekî xisareke civakî ye. Pûşpera sala 1396`an Perwîz Efşar berdevkê Navenda Xebata li dijî madeyên muxedir, hejmara mu`itadên ku berdewam madeyên muxedir bi kar tînin di Îranê de, 2 milyon û 808 hezar kes ragehand.

Li gora lêkolînên Wezareta Tendirustiyê ku encama wê di roja 19.10.1396`an de hate ragehandin, nêzî %24 ji xelkê Îranê rastî kêşeyên derûnî hatine. Nûçegihaniya "IRNA"yê ji zimanê cihgirê Wezîrê Tendirustiyê ve ragehandiye ku 6 milyon û 300 hezar kes tûşî nexweşiya xemokiyê bûne, û lêkolînên vê wezaretxaneyê bas ji vê dikin ku %6.23 ji Îraniyan tûşî kêşeyên derûnî ne, û li ser hev %7.12 ji nifûsa 15-63 salî di Îranê de rastî xemokiyê hatine.

Lêkolînên zanîngeha "Ilûmê pizişkî" ya Tehranê di salên 1378-1387`an nîşan dide ku asta belavbûna kêşeyên derûnî di nava xelkê Îranê di navbera van neh salan de %60 zêde kiriye, û gihaye zêdetir ji %34.

Hevdem digel berfirehbûna kêşeyên civakî di Îranê de, gendeliya dezgehan, û navendên hikûmetî û berpirsên asta bilind ya welat jî herikîneke ber bi jor hebûne. Ehmed Tewekulî nûnerê meclisa Şêvra Îslamî ku serdemekê serokatiya navenda lêkolînên meclisê li stû bû, bas ji gihîştina Komara Îslamî bi "qonaxa gendeliya sîstematîk" kiriye, û pêdagirî kiriye, ku "Navendên berpirsyar di warê xebata li dijî gendeliyê bixwe tûşî gendeliyê bûne". Navenda navneteweyî ya zelaliya aborî jî tevî lêkolîna derbarê 177 welatan di sala borî de, Komara Îslamî di warê gendeliya aborî û îdarî de xistiye nava pileya 144`an de.

Bi heman awayî em dikarin hejmareke din jî bi rêzbenda bêserûberiyan û kêşeyên xelkê Îranê ve zêde bikin, ku encama siyaset û bernmayên navxweyî û derveyî ên rejîma Îranê bûne, û encama wê jî bo xelkê weha bûye:

1-Vegeşîna bilez ya serjimêriya xwekujiyê: Nûçeya "online" ya roja 28`ê Xezelwera 1396`an nivîsand: Xwekujî di Îranê de bi awayekî cihê heyrîmanê di halê zêdebûnê de ye. Dosiyeya hewldan bo xwekuştinê ji sala 1390-94`an (Di pênc salan) de, zêdebûna %66 di nava jinan, û %71 di nava mêran de hebûye. Niha Îranê pileya yekem di xweşevitandina jinan di Rojhilata Navîn de heye (Weşana Cehanê Sen`et 14.03.1396).

2-Nemana kêfxweşiyê di nava xelkê de, û guherînê wê bo civakeke tundûtîj. Saziya pizişkê yasayî di Befranbara 1395`an ragehand ku di heşt mehên yekem yên vê salê de zêdetir ji 400 hezar birîndaran serdana vê saziyê kirine, ku hemû jî bi sedema şer û pevçûna bi hev re bûye.

Ew yek heman dojeh (cehnem) e, ku rejîma Îranê bo xelkê xwe pêk aniye, niha ew xelk piştî çend dehikên berdewam rêçareya rizgariya xwe ji vê cehnemê bi dirustî di sernixûniya rejîmê de dibînin.

Ku wisa bû sedema nerazîbûna xelkê ji vê rejîmê xwediyê gellek biyavên wekî nebûna azadî, serkut û zexta zêde ya li dijî kêmaniyên olî û mesebî, serkut û şikandina neteweyên xeyrîfars, û talana çavkaniyên avî û bin`erd ên herêmên derdora Îranê, û stemên bêqas ên din li dijî xelkê Îranê ye, û kêşeya aborî tenê biyaveke wê ye ku rejîm dixwaze da ku bi mezin nîşandana wê, aliyên din ên nerazîbûna bipeçêve, lê nikarin bo heta heta xelkê bixapîne.

www.arsivakurd.org

Hevpeyvînek digel Şerîf Hejarî derheq pirsên girîng ên rojevê

Şerîf Hejarî mamostayê zanîngehê

Şerîf Hejarî: Hin ji hêzên kurdî, bûne kopalê destê Îranê û fermanên wê cîbicî dikin.

Guhertinên nav kabîneya Donald Tramp û bandora wê li ser hevkêşeyên siyasî û bûyeran, mijara gotûbêjekê ye digel birêz Şerîf Hejarî, Mamostayê Zanîngeha Silêmaniyê ku bala we bo beşek ji wê radikişînin:

H: Selîm Zencîrî

Pirs: Ew guherînkariyên di kabîneya Tramp de dikare çi guherînekê di siyaseta derve ya Amerîkayê derheq Rojhilata Navîn li pey xwe bîne?

Bersiv: Min jêve ye ku ew guherînkarî bo armancekê ye ku Trump bixwe bawerî pê heye, û di dema piropagendeya hilbijartinan de soz daye gelê Amerîkayê ku ji bo bidestxistina wan tekoşînê bike. Ew guherînkarî bi wateya girtinepêş ya siyaseteke cidî ya Amerîkayê ye li hemberî dosiyeyên Kureya Bakur û Îranê. Niha egera rûniştina serokê Amerîka û Kureya Bakur heye, lê li derheq Rojhilata Navîn min jêve ye ku Trump bawerî bi vê heye ku ji bona ku Amerîka di vê navberê de hejmoniya xwe biparêze, pêwîst e ku ecêndayên Îranê ji nav bibe. Lê ewên ku berpirsê yekem bûn di Wezareta Deve û Ewlehiya Neteweyî ya Amerîkayê de, digel nasîna rastîn ya Trump li dijî terorê û tevdanîkariyên Îranê di Rojhilata Navîn de, hev nedigirtin.

Ew karakterên ku Trump diyarî kirine, baştir rejîma Îranê nas dikin, bo mînak Trump li ser vê baweriyê ye ku şaşiya mezin ku Obama kiriye, lihevkirina digel Îranê ye, û Îran mezintirîn piştevanê terorîzmê ye di cîhanê de. Hevtayê vê bîrkirinê jî, Boltonê destnîşankirî ji bo şêvirmendiya Asayişa Neteweyî ya Amerîkayê, baweriya wî ya neguher ew e ku Amerîka û Îsraîl tenê bi bordûmankirinê dikarin rêgiriyê ji Îraneke navikî bikin. Herwisa Mike Pompeo`yê destnîşankirî bo Wezîrê Derve yê Amerîkayê jî li ser vê baweriyê ye ku ew bi kêmtir ji 2 hezar êrîşên balafiran dikarin pirograma navikî ya Îranê ji nav bibin.

Bi hûrbûna ji van boçûnan derdikeve ku Trump dixwaze ku tîmeke yekdest di kabîneya xwe de pêk bîne, ku li ser yek baweriyê, û yek ecindayê di hemberî Rojhilata Navîn bitaybetî Îranê, ku wekî çavkaniya terorîzmê tê naskirin, bikevin kar.

Pirs: Ku wisa bû mebest ji guherîna wan, zêdetir sekinandina Îranê ye?

Bersiv: Dema ku "Mike Pompeo" lêpirsyarê "CIA" bû, karê wî yê herî xûya guherînkarî bû li beşa dosiyeya Îranê, di destpêka Tîrmeh a 2017`an de. Herwisa "Michael D'Andrea" kire lêpirsyarê "CIA" bo dosiyeya Îranê. Bi bawera min heya niha şûna destê wî di tewerên navxwe yên Îranê de berhemdar bûye.

Mixabin ku heya niha lêkolerên Kurd di xwendina bo kesayetiyên dosiyeya (Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriye) ya dezgeha "CIA" de, lawaz in, û di medyayên Kurdistanê de jî girîngî pê nahê dayîn. Michael D'Andrea roleke mezin di destbiserkirina tawanbarên 11`ê Îlonê, û herwisa li Pakistan û Yemen û gellek welatên Rojhilata Navîn de lîstiye, bi taybetî rola diyar hebûye di kuştina terorîst Îmad Muxniye, serkirdeyê bibandor yê Hizbullahê di Demişqa paytexta Sûriyê de.

Niha "Michael D'Andrea" naznavê Ayetullah "Michael D'Andrea" li ser hatiye danîn. Wisa nabînim ku ew hemû guherînkarî her li xwe re hatibin kirin. Min pê waye tunekirina ecindayên rejîma terorîst a Îranê di holê de ye. Bi Kurtî Trump bi van guherînkariyên dixwaze ku bêje Îran û hemû cîhanê, ku di hemû demeke deshilatdariyê de, vebijêrka leşkerî li dijî Îranê vekirî ye!.

Pirs: Bi baldan bi nakokiyên Îran û Ewropayê li ser rêkkevtina li ser Bercamê pêşniyara çi sînaryoyan bo piştî van guherînan dikî?.

Bersiv: Diyar e ku Amerîka heya radeyekê rêz ji welatên Ewropî yên hevpeymanê xwe derheq pirsên Rojhilata Navîn digre. Bo mînak derheq lêdana Îraqê, Amerîkayê heya sînorekê girîngî bi boçûna dewletên wekî Firansaya serdema Jacques René Chirac (Jak Şîrak) û hinek ji hevpeymanên xwe ên Ewropî da, lê piştre serbarê cuda bîrkirina wan, rasterast lêdana Îraqê ragehand.

Sê eger li ber dest de hene ku tramp bigre pêşiya xwe, di derbarê Bercamê de:

1-Pêdeçûna bingehîn bi ser rêkkevtinê ji aliyê Amerîkayê ve.
2-Hilweşandina yek alî ya rêkkevtinê ji aliyê Amerîkayê ve. Di vê derheqê Wezîrê Derve li ser vê baweriyê ye ku di destpêka meha Gulan a îsal de, Trump ji lihevkirina etomî vedikêşe, jiber ku soz daye Îsraîlê ku rêkkevtineke wisa qebûl nake.
3-Lêdana binkeyên etomî ên Îranê ji aliyê Amerîka û Îsraîlê ve. Pêştir Bolton di gotareke xwe ya "New York Times"ê de belav kiribû û nivîsandibû ku "tenê êrîşa leşkerî çareseriya

www.arsivakurd.org

bernameya navikî ya Îranê dike. “

Heta hekî rewşa rêkkevtinê bi vî awayê niha jî bimîne, Îranê qazanceke wisa tê de nekiriye, jiber ku Amerîka di piraktîkê de tu hisabekê bo vê rêkkevtinameyê nake, û ne tenê lênihêrîna Amerîkayê li hemberî rejîma Îranê nehatiye guhertin, belku tundtir jî bûye. Ger em lê hûr bin, di şeş mehên borî de, diravê Îranê xiraptirîn û erzantirîn nirx di dîroka xwe de tomar kiriye, ku ew jî vê yekê nîşan dide, ku di navenda Piraktîka siyasî-stratejî ya Amerîkayê de, rejîma Îranê di lîsta reş de ye. Destpêkê vê rejîmê di warê aborî û diravî de diherifînin, û piştre encamên wê ên din jî wê hebin.

Pirs:Di vê navberê de gefek bi navê Rûsiyê bo ser berjewendiyê Rojava dikare çi bandorekê li ser yekhelwestiya Amerîka û Ewropayê, li ser vê meselê danê?

Bersiv: Gefa Rûsiyê cidî ye, û micidtir jî dibe,heta ku metirsiya Rûsiyê li ser berjewendiyên Rojava zêdetir be, dewletên Rojava jî yekgirtîr dibin. Bo mînak di van dawiyane de kuştina ajanekê û keça wê ji aliyê Rûsiyê ve, dijkiryareke zêde hebû, û Birîtaniya û YE û Amerîkayê hejmarek dîplamotkarên Rûsiyê derxistin.

Rûsiye mezinhêzeke cîhanî ye,nifûza dîrokî heye, jeopolîtîkek bibandor heye, lê gelo welatên Rojava û NATO`yê lê digerin ku Îran bibe beşeke cîbicîkirina ecindayên Rûsiyê, û Esed jî karekê bike ku Rûsiye bi dilê xwe di behra Naverast de bilîze? Bê guman lê nagerin, û aboriya welatên Rojavayî û jeopolîtîka wan, û nifûz, hevpeyman, û teknolojiya wan wisa dike ku Rûsiye heta ser nekare Sûriyê û Îranê di destê dîktatoran de bihêle.

Lê ew rikeberî demê dixwaze, û di şev û rojekê de bi dawî nabe! Lê heya ku Îran û Esed hevpeymanê serekî ê Rûsiyê bin, Rojava li dijî wan yekgirtîtir dibe.

Niha rikeberî di navbera Amerîka û Rûsiyê de ew e ku, Amerîka wekî mezinhêza cîhanê nifûz bi ser hemû aliyên cîhanê de hebe, Rûsiye jî tenê dixwaze ku li ser cîranan û derdorê de hejmoniya xwe biselimîne, lewra di rastî de nifûza Amerîkayê, wekî mezinhêztirînê cîhanê, û hejmoniya Rûsiyê wekî mezinhêzekê di cîhanê de cudahiya di navbera wan de zor e.

Niha wekî serdema şerê sar nine ku şer cîhan dagirtibe, li Angola heya Kûba û ji vir ve jî heya Rojhilata Navîn dirêj bibe, yan di navbera du îdeolojiyên lîberalîzm û komonîzmê de be, belku Rûsiyê şanaseke îdeolojî nemaye, û şer nêzî sînorên Rûsiyê bûye. Her li Sûriyê ve bo Îran û heya digihîje Gurcistan û Okraynê. Ku wisa bû em nikarin çavnihêrê vê bin ku Rûsiye wekî mezinhêzekê bi hêsanî xwe bide dest. Lê di stratejiyê de Rûsiyê şiyana hêla rejîmên dîktator wekî Sûriye û Îranê nine!.

Pirs: Bi berçavgirtina hemû wan sinaryoyan, çiqas dikarin paşekêşê bi stratejiya Îranê di navçeyê de bikin, û di encam de guherîna rejîmê li pey xwe hebe?

Bersiv: Qonaxa rejîma Îranê ber bi paşekêşê ye. Niha ecêndayên derekî rû li şikestê ne, û di stratejiyê de jî şer dixin nava Îranê de, û hiloşandina vê rejîmê lê dikeve.

Pirs: Serbarê serdestiya Îranê di Sûriyê de niha bas ji paşekêşana Amerîka li Sûriyê û cihgirtina Fransayê baseke germ ya çavdêrên siyasî ye, xwendina we bo vê yekê çi ye?

Bersiv: Ez ne bawer im ku bi awayekî radîkal hemû hêz û şêvirmendên Amerîkayê ji Sûriyê bêne vekişandin, jiber ku taybetmendiya împeratoriyeta Amerîkayî cudatir e ji taybetmendiya împeratoriyên din, lewra dema ku çû nava her xakekê, zehmet e ku bi tewahî jê vekişe, lê ew cihgirtin çend biyavên wê hene.

-Biyavê dîrokî: Min jêve ye ku hinek bûyerên dîrokî hene, ku di demên cuda yan di cihên cuda de dubare dibin, û li gora encama piraktîzeya rêkkevtinameya Sayks-Pîko-Sazanov, Fransayê bûye xwediyê wilayeta şam (Sûriye û Lubnan îro). Taybetmendiya dagîrkeriya Fransayê (kulturî) bû, wate hewl dida ku kultur û zimanê Fransî bi ser van gelên ku têne dagîrkirin, bê belavkirin, lewra Fransayê kesên xwe hene, di nava Sûriyê de, eva jî dikare wisa be ku Firansa zêdetr ji rwşa civakî û siyasî ya di nav Sûriyê tê bigihîje, heya Amerîka.

-Amerîka dixwaze ku di piraktîkê de biselimîne ku hevalbendên wê jî dike şirîk di zêdexwaziyn xwe de, bi vî awayî rol dide hevpeymanên xwe yên Ewropî, û eva jî parvekirina hêzê ye.

-Dikare ku Amerîka ji diya xwe (împeratoriya Birîtanyayê) ezmûn wergirtibe, ku carna hejmoniyên wê bikeve ber zêdexwaziya Rûsiyê, lewra wekî Birîtanyayê, ew ciyê ku

kêşe û rikeberî li ser heye, bi hevpeymaneke xwe tejî dike.

-Sedemek din ew e ku nexwaze dilê Tirkiyê hevpeymanê stratejiya xwe di pêxema PYD`ê de bêşîne, belku bi leyîzeke siyasiyane xwe ji vê leyîzê dûr dixe, yan renge jî Amerîka bixwaze ku şêwazeke nû bona rûbirûbûna Rûsiyê di Sûriyê de bi kar bîne.

Pirs: Di vê navberê de Tirkiye çi lê tê? Gelo zêdexwaziyên wê her wa domdar dibin?

Bersiv: Erdoxan siyasiyeke fêlbaz e, û bi başî ji girîngiya jeopolîtîkiya Tirkiyê dizane, niha Erdoxan dizane ku çawa bo berjewendiya Tirkan hem dîn bi kar bîne, û hem jî rikeberiya di navbera Rûsiyê û Amerîka bona pêkana berjewendiyên xwe bi kar bîne. Helbet serkevtinên Erdoxan beşek girêdayî vê rewta Kurdî ye, ku dijberiya Erdoxan dike, lê xwediyê stratejiyeke zelal ya neteweyî ya Kurdî nine!.

Berjewendiyên Tirkiyê wekî hêzeke NATO`yê û ya Firansayê jî wekî hêzeke din ya NATO`yê cuda, û heya qasekî jî ecêndayên wan jî nakok in di nava xaka Sûriyê de. Lewra Firansa ji her hêzeke din ya navdewletî zêdetir girîngiyê dide pirsa Kurd. Di vê yekê de, bicîhanîbûna pirsa Kurd ji aliyê Qasimlo ve, roleke mezin di rakêşana Firansayê bo aliyê pirsa Kurd hebûye, lê yek stratîj Tirkiyeya Erdoxanê îxwanî û Firansaya Rojavayî li dewra yek kom dike, ew jî dijberiya hejmoniya Îranê û rûxandina Esed û kêmkirina hejmoniya Rûsiyê di xaka Sûriyê de ye.

Pirs: Bi giştî ew guherînkarî çiqas di berjewendiya Kurd de dibin, yan hûn bandorên wê li ser pirsa Kurd çawa dibînin?

Bersiv: Min pê waye ku hekî em bêjin rewş ji bo Kurd baş nabe, û derfet nahê pêş, eva rastbêj û rasteqîne nîne. Kurd bixwe derfetan wekî hewce bi kar nahînin. Beşek ji hêzên Kurdî bûne dardestê Îranê, û bi tu şermekê fermanên Îranê cîbicî dikin. Herçend ku Îran dixwaze gemaroya aborî bixe ser beşên Kurdistanê, û tevdanîkarî û terorê di başûr de bidomîne, lê ew kar tenê pêkutan û xwe hilkutana dawiya temenê wê ye, û li stratejiyê de rûxana Îranê tê wateya tunebûna rejîma herî tirsnak ya dijî Kurd, û heliyana bîra teng ya tewaw ya wan qelembi dest ên caş-bîr e, ku niha di başûra Kurdistanê wekî model û bi hevkarîkirina rasterast ya konsola Îranê di nava takê Kurd de belav dikin. Ez rûxana rejîma Îranê hetmî dizanim, ku ew yek jî sedî sed di berjewendiya Kurd de ye, û wan hizbên ku xwe pê ve jî girtine, di paşekêşe û aşbetalê de ne, ku ew yek jî kêmekê bêhnfirehiyê dixwaze.

Pirs: Kurd yan tevgera siyasî ya Kurd çawa dikare mifahê ji vê rewşê wergire ku pêk hatiye?

Bersiv: Tu dibe bixwe azadiyê bixwazî, ne eva ku tu bindestî û biratiya gelan û pêşkêşkirina Kerkûkê bi dagîkeran bixwazî, û li cem hêzên opozisyonê jî bîra neteweyî bi eyb û şerm bizanî, û bêjî ku modêla wê nemaye, lê piştre bêjî “Bo Amerîka nahê bergiriyê ji me bike, û azadiyê bibexşe me”!.

Çareseriya Pirsa krd tenê û tenê yekrêzî ye, lê hekî yekrêzî jî sernegirt, dibe ku hêzên neteweyî ên her çar perçeyan, mîsaqeke şerefê bi nihênî îmza bikin, û li ser çend xalan bo parastina berjewendiyên neteweyî, û egeran û bikaranîna derfetan li hev bikin, û netirsane li dema nêzîkbûna derfetan de bi bê guhdana bi rage-handinan, bi xafilandin, caş-bîran û alavên dest dagîrkeran di vê parçeyê de ku derfet jê wan re hatiye pêş tune bikin.!

Lê hekî dubendî her hebe, yekrêzî pêk nehê, û beşek ji hêzan her bawerî pê nehê kirin, û di derfetan de hemû deskevtekê

»»» Dom R:8

www.arsivakurdi.org

Nerîna Lîderan

Baydemir:

“ Em dixwazin ligel partiyên Kurdî tifaqê bikin”.

Sezai Temell:

“Ji bo hesabê hilbijartinê operasyon dan destpêkirin”.

Elcobeyr:

“Me pêşniyar kir, da ku hêzên hevalbendiya Îslamî bo Sûriyê bêne şandin”.

Xamineyî:

“Amerîka û Firansa û Birîtanya cinayetkar in”.

Şîrîn Îbadî: Reform di rejîma Îranê de bê encam e

Xelatwergêra Aştiyê a “Nobel”ê dibêje ku, ji bo xelkê Îranê rohn bûye ku nizama siyasî a Îranê reform tê de nayê kirin.

“Şîrîn Îbadî” di gotûbêja digel medyaya Întêrnêtî a “Bloomberge” de gotiye ku: Xelkê Îranê li pey “guherîna nizama siyasî” û “yasaya bingehî” a wî welatî, û danîna yasayeke bingehîn ya “secular” li gora carnameya cîhanî ya mafê mirovan” in.
“Şîrîn Îbadî” çalakvana mafê mirovan, herwisa daye zanîn ku tu demî ser vê baweriyê nebûye ku, “Hesen Rohanî” referomxaz be, û herwisa navbirî îşare bi nerazîbûnên xelkê yên di meha Befranbara sala derbazbûyî a Îranê de kir, û derheqê nebûna rêberekê di nav nerazîbûnan de jî da zanîn ku, di rewta xebatê de rêber derdikevin, dema ku hilbijaritinên serbest û azad di Îranê de bên encamdan, wê demê wê rêber jî derkevin.

Di heyamên borî de jî, navbirî digel hejmarek ji çalakvanên siyasî û medenî yên Îranê di daxuyaniyekê de, daxwaza lidarxistina giştîpirsiyê di Îranê de û herwisa diyarîkirina curek ji hikûmetê ji bo wî welatî, û guherîna aştiyane a nizama siyasî ya Îranê kiribûn.

Ew wergêra xelata aştiyê ya “Nobel”ê di heyamên borî de, di gotûbêja digel “Euronews”ê de jî ragehandibû ku: Serkomarê rejîma Îranê berpirsyarê piraniya wan bûyeran e, ku di Îranê de diqewimin.

Thomas Friedman: Xwe ji bo şerê di navbera Îran û Îsra`îlê de amade bikin

“Thomas Friedman” yek ji rojnamevanê naskirî yê Amerîkayê, di rapora rojnameya “NewYork Times”ê de belav kiriye ku, şerekî din li Sûriyê di navbera rejîma Îran û Îsra`îlê de wê çê bibe.

Thomas Friedman yek ji rojnamevanê naskirî yê Amerîkayê, di raporeke rojnameya “New Yok Times”ê de bas ji vê kiriye ku, heyanî niha rejîma Îran û Îsra`îlê bi bêdengî şer kirine, lê ji wir şûnda rejîma Îran û Îsra`îlê, di Sûriyê de rasterast wê şer bikin.

Navbirî di vê raporê de nivîsandiye: Hekî we pêştir eva bihîstibe, min ragirin, Sûriye wê biteqe, dizanim ku eva we bihîstiye, lê vê carê bi rastî Sûriye wê biteqe.

Thomas Friedman di vê raporê de nivîsiye ku: “Piştî êrîşa Amerîkayê û hevalbendan bo ser Sûriyê, hevdem egera şerê di navbera rejîma Îran û Îsraîlê jî, zêde bûye.

Navbirî di vê derheqê de jî axivî, û got ku, yekem şerê di navbera Îsra`îl û rejîma Îranê de, di 10`ê Şibatê de çê bû, û ev jî di heyamekê de bû ku balarfireke bê pîlot ya rejîma Îranê piştî evê ku çû bû nav axa Îsaî`lê, ji aliyê artêşa Îsra`îlê ve kevtibû xwarê, û piştî lêkolînên derheqê parçên vê balafira bê pîlot ya Îranê ji aliyê dezgeha zanyarî a Îsra`îlê ve fermanderê bi navê “Runîn Mênalls” gotûbêjê artêşa Îsra`îlê ve hate eşkerekirin, ku ev balafira bê pîlot ya rejîma Îranê kelûpelên teqînê hilgirtine, û erk û wezîfeya bombebarankirinê jî hebûye.

Piştî çendîn caran êrîşên artêşa Îsra`îlê bo ser binke û hêzên rejîma Îranê di Sûriyê de, “Elîekber Wilayetî” şêvirmendê Xamineyî bi fermî ragehand ku ew wan tawanan bê bersiv nahêlin.

Hevdem berpirsekî Îsra`îlê jî bi fermî ragehand ku, ewê êrîşî ser binesaziyên leşkerî yên rejîma Îranê bikin.

www.kurdî.org

»»» Doma manşêtê

"Niha jî tevî daxistina ser ji nû ya sînorên kolberiyê, yasayên gumrikî jî bi zirara kesên kalayan tînin û dibin guheriye, û bi vî awayî carek din jiyana vî xelkê xistine metirsiyê de. Rastiyek ku ew hinda din jî kerb û bêkariya xelkê van navçeyan lê ketiye, û eva ye ku karbidest tu piroje û bernameyeke aborî bo jiyan û birêveçûna vî xelkî tunînin, ku kolberî, û hînan û firotina alavan li wan qedexe kirine.

Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê girevgirtin û nerazînîşandana xelkê bajarên sînorî, wekî hereketeke medenî ya hilgirê daxwaziyên rewa û mirovî dizane, û bi tewahî piştevaniya wan dike.

Nîşandana sivka betall û deng bilindkirina li dijî wan hemû tawan û û qedexeyan ku rejîma Îranê bona tunekirina çavkaniya jiyana zehmetkêştirîn beşên xelkê bi rê ve dibe, mafê herî destpêkî yê vî xelkê ye".



Her di vê biyavê de xwendekarên zankoya Peyama Nûr ya Merîwanê jî bi weşandina daxuyaniyekê piştgiriya xwe ji girevgirtiyên Kurdistanê nîşan dane, û ragehandine:
"Em jî wekî çîna xwendekar ya Merîwanê, piştgiriya xwe ji girevgirtiyan radigehînin, û ji xelkê Kurdistanê daxwaz dikin, ku:
Bi daxistina bazaran li hemû bajaran, piştevaniyê ji girevgirtiyên bazara Merîwan û Bane û Ciwanroyê bikin.
Herwisa dibe ku çînên cuda yên din ên civakê (karsaz û xwendekar û …hwd) bo piştevaniya ji girevê, helwesta xwe eşkere bikin. Xelkê nerazî heya gihîştina bi daxwazên xwe, wê berdewam bin li ser girevê".

»»» Doma R:6

bibexşin dagîrkeran, eva dehan derfetên din jî bêne pêş, wê ji dest bidin. Belkû dibe wek
şoreşa rizgarîxwaziya gelên din bi xafilandun, mîkrobên navxwe ceza bikin, hekî ne, wê dîrokê hertim dubare bikin!.

Pird: Kurdê Rojhilat û partiyên siyasî dibe çi siyasetekê berçav bigrin, ku di vê derfetê de bi qazanca wan bişkê?

Bersiv: Herçend rewşa opozisyona Kurdî di Rojhilat li Herêma Kurdistanê de li jêr gefa tirsnak ya terorkirinê de ye, lê sedî sed min pê waye ku pêşeroja wan ronahî ye.

Ez dixwazim ku bi eşkere bêjim, min hêviyeke wisa bi beşek hêzên Rojhilata Kurdistanê nine.

Jiber ku serbixwe nînin, ku ew yek gelekî tirsnak e bo niha û pêşeroja Rojhilata Kurdistanê. jiber ku hertim ji riyan wna ve ye ku aliyê din dikarin destêwerdanê di nava karûbarên vê parçeyê de bikin. Heta dagîrker jî faydê lê dibînin.!

Min jê ve ye ku PDKÎ wekî serekîtirîn hêza Rojhilat, dibe ku vê yekê yekalî bike, ku zêdetir ji asta hewce pêşmerge hebe, jiber ku em di Rojhilata Navîn de dijîn, û em Kurd in jî!!.

Bi kurtî PDKÎ dibe ku li ser du binge-

han kar bike:

-Di awayekî eşkere û di warê ragehandinê de, mîsaqeke neteweyî digel hinek ji hêzên Rojhilat îmze bike bo derfetan, lê bi hûrî bizane ku encamên vê mîsaqê çi jê şîn dibe.

-Di biyavê nihênî de jî, tewahiya egeran û pêşhatan, û derfetan di organa herî bilind de, bi nivîskî kom bike, û wisa danê ku mîsaqa yekem digel hizbên Rojhilat ser nagre, belku PDKÎ bi xwe kar li ser bike, bona vê ku hekî vebijêrka yekem ser negirt, eva PDKÎ bi xwe paketa duyem di ber dest de be, û piraktîze bike.

Dawî gotina we?

Bersiv: Girînge PDKÎ nûneratiyên xwe bi taybetî li Amerîka, Kanada, û Birîtanya, bihêz bike, û di asta navçeyî de jî, girîngiyê bide pêwendiyan, li gora serkevtina hêzên qonaxê û jeopolîtîkê! rewşê berçav bigre. Stratejiya faşîstî ya mezhebîneteweyî ya rejêîma Îranê, bona şûştina bîra neteweyî ya takên Kurd e, û heta rejîma Îranê bi xwe hinek ji qelembidestên Başûra Kurdistanê jî bi kar tîne, gelo di asta vê pilana nû de, bizava neteweyî dibe ku kîjan rêkaran bigre pêş?.

Çawa bîra netewyeî ya Kurdî di warê teorî de, li gora qonaxê dadirêje, û bi piraktîka şoreşgerane jî xwe diselimîne!?.

www.arsivakurd.org

Lêborîna Navneteweyî: Îran duyem welat e di biyavê îdaman de

Lêborîna Navneteweyî rapora xwe ya salane derbarê îdaman de belav kir, û Îran wekî duyem welat di warê serjimêriya zêde ya îdaman de, da nasandin.

Di vê raporê de hatiye ku 142 welatan cezaya îdamê ji nav yasayên xwe rakirine, lê di sala borî de 23 welatan cezaya îdamê di welatên xwe de cîbicî kirine.

Li ser bingeha rapora Saziya Lêborîna Navneetweyî di sala borî de aliyê kêm 507 kes di Îranê de hatine îdamkirin, ku zêdetir ji nîva wan îdaman e ku di asta cîhan de hatine cîbicîkirin. Ew rêje li gora sala 2016`an %11 kêm kiriye, lê li çav welatên din heta niha jî ji hemiyan zêdetir e.

Piştî Îranê, Erebistan bi 146 îdaman û Îraq û Pakistan bi 125 û 60 îdaman di sala 2017`an de zêdetirîn hejmara îdaman bûye.

Tendirustiya Zeyneb Celaliyan piştî berdewambûna li ser girevê ne baş e

Ajansa Kurdpa: Rewşa girtiyeke Kurd di girtîgeha bajarê Xoyê piştî girevê ne baş hatiye ragehandin.

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa Nûçegihaniya Kurdpayê, Zeyneb Celaliyan girtiya siyasî a Kurd di girtîgeha bajarê Xoyê pê daniye nava 11.mîn sala di girtîgehê de, û bi sedema zêdetir ji yek salî gireva derzî dermanan û pêrenegihîştina pizîşkî di rewşeke ne baş ya girtinê de derbaz dike.

Li gora çavkaniyeke agehdar di heyama sala borî de, berpirsên girtîgehê bi awayê berdewam digel çareseriya pizişkî ya vê girtiya siyasî a Kurd li derveyî girtîgehê dijberî kirine.

Ew çavkanî di dirêjiyê de dibêje: Serbarê pêşniyara malbata vê girtiya siyasî ya Kurd bona bidawîanîna bi girevê, Zeyneb gireva xwe domandiye.

Vê çavkaniyê bas ji vê yekê jî kiriye ku: Ew girtiya siyasî ya Kurd bi giranî nexweş e, û hewcehiya wê bi çavdêriya taybetî ya pisporî li derveyî girtîgehê heye.

Pêştir jî Zeyneb Celaliyan di girtîgeha Kirmaşanê tûşî nexweşiya "Naxunek" bibû, û ew nexweşî bû sedema lawazbûna çavên navbirî, heya niha jî tu hewlek bo çareseriya wê nehatiye dan.

Li gora rapora Rêkxirawa Lêborîna Navneteweyî, berpirsên girtîgehê û Dezgeha Dadweriyê serbarê rewşa nebaş ya tendirustiya Zeyneb Celaliyan girtiya siyasî ya mehkûm bi girtina heta-hetayî digel çareseriya pizîşkî ya navbirî li derveyî girtîgehê dijayetî kirine.

Rêkxirawa Lêborîna Navneteweyî amadenebûn bo çareseriya pizişkî bo Zeyneb Celaliyan wekî cezayeke tund û wergirtina îfadeya bizorî ji navbirî bi nav kirine.

Zeyneb Celaliyan bi tawana endametî û hevkariya digel yek ji partiyên Kurdî ên opozisyona hikûmeta Îranê wekî "Miharib" hatiye naskirin.

Meşên nerazîbûnên di destpêka sala nû di Îranê de

Di destpêka sala nû de, şîpeleke nerazîbûnan li nav texên curbicur yên civakê, di seranserê Îranê de dest pê kiriye.

Di piraniya bajarên Îranê de, kedkar, karmend û cotkar di destpêka sala 1397`an de, bi bi girevgirtinê, û xwenîşandanan, ji ber wernegirtina heqdestên çendîn mehan, û pirsgirêkên aborî û herwiha nîşandana nerazîbûnan ji ber daxistina Karxaneyên pîşeyî û betalbûna hezaran kesî, û herwisa pirsgirêka kêm aviyê ji bo cotyaran, şîpeleke nû a nerazîbûnan di seranserê Îranê de dest pê kirine, ku heya niha jî dom heye.
Ev tex û çînên ku dest avêtine girevê, û xwenîşandanan, nerazîbûna xwe ji ber xemsariyên berpirsên rejîmê, û xemsariya wan berpirsan ji jiyan û dahata xelkê bûye.
Herwisa bera serekî a nerazîbûnan ber bi rejîma Îranê ne, û daxwaza çareseriya pirsgirêkên xwe dikin.

Kedkarên derxistî yên bajarê Ehwazê, Kedkarên agir vemirandinê yên Petrolê û gaza Eseloyê, Kedkarên Karxaneya Rûnê Nebatî ê Xunçe, û Kedkarên şaredariya Hemîdiyê a bajarê Mazenderanê, Kedkarên Mitalojî a Pûdra Qezwînê, Nesaciya Xamênê ya di parêzgeha Azerbaycana Rojhilat de, Karxaneya Pirofîl a Sawê, û…hwd berdewam nerazîbûna xwe nîşan dane û didin.
Kedkarên Karxaneya Polad a Urmiyê, ku di sala 1396`an de, derheqê wernegirtina heqdestên çend mehên xwe nerazîbûna xwe nîşan dabûn, piştî bidawîhatina rojên bêhnvedana Newrozê dîsan li pêşberî parêzgariya Urmriyê kom bûn, û bi nerazîbûnên xwe domandin.
Herwisa kasibkarên bajarên sînorî yên weke Seqiz, Bane, Merîwan û Ciwanroyê, ji ber daxistina sînoran, bi daxistina dukanên xwe dest bi girevê kirin.
Herwisa di parêzgeha Kirmaşanê de jî,terşdarên bajarê Serpola Zehawê, ku bi sebeba erdhejê beşek zêde ji terşên wan jinav çûbûn, û rejîmê jî soz dabû ku xesarê bide wan, lê rejîmê piştî derbazbûna zêdeyî 5 mehan bi ser erdhejê, heyanî niha jî xesara terşên jinavçûyî nedaye, û kesên terşdar jî dest bi xwenîşandanên nerazbûnên kirine.
Hêjayî basê ye ku, ew xwenîşandanên pîşeyî, û ên sertaserî, bi awayê giştî li hemberî siyasetên rejîma Îranê de ne.
Mînaka herî girîng xwenîşandanên bajarê Ehwazê ne, ku bi armanca berevanîkirin ji mafên neteweyî, ew meş bi rê ve birin.

www.arsivakurd.org

Seydayê Cegerxwîn û dîrok

Seydayê Cegerxwîn ne tenê helbestvan bû, lê wî guhdaneke mezin bi warê dîrokê jî dikir. Di piraniya berhem û dîwanên wî de, behsa dîroka Kurdistanê tê kirin, herwiha navê kesayetiyên dîrokî yên gelê Kurd tên bibîranîn.



Li ser aliyê dîrokî di helbestên Cegerxwîn de pirtûkeke nû hate çapkirin û belavkirin. Pirtûka nû bi awayekî berfireh li ser mijara dîrokê li ba Seydayê Cegerxwîn disekine û zanyariyên nû pêşkêş dike.

Siyasetmedar û qanûnzanê Romayî yê navdar Cicero ku berî zayînê jiyaye li ser dîrokê wiha dibêje: “Her kesê dîrokê nexwîne, dê her û her mîna zarokekî biçûk bimîne.” Çimkî kesê dîrokê bi hûrbînî û kûrbînî nexwîne, dê çewtî û xeletiyên wê dubare bike û dema xwe ya niha û siberoja xwe jî winda bike. Lewra jî derketina her berhemeke li ser dîrokê, nexasim li ba kesekî nola Seydayê Cegerxwîn karekî erênî ye.

Di vî warî de, nivîskarê Kurd Îbrahîm Îbrahîm ku sala1971ê li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye, pirtûka xwe ya nû bi navê “Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn De” belav kir.

Di destpêka kitêbê de, nivîskar Îbrahîm Îbrahîm ku sala 1997an Beşê Dîrokê li Zanîngeha Şamê qedandiye, li ser sedema çêkirina kitêbê û hilbijartina aliyê dîrokî li ba Seydayê Cegerxwîn wiha dibêje:

“Cegerxwîn di dîroka wêje û edebiyata Kurdî ya modern de gewretirîn helbestvanê Kurd e. Bi berhemên xwe yên curbicur çanda Kurdî dewlemend kir. Herwiha xiznên pêzanîn û amajeyên dîrokî ku helbestên wî di bin perên xwe de vedişartin. Lewra jî me ji bo lêkolînê, helbestên Cegerxwîn hilbijartin. Da em bibînin bê çawa dîroka Kurdan di wan berheman de reng vedaye û pêwendiya navbera helbestên wî û dîroka Kurdan bi awayekî zelal û tekûz bidin xuyakirin.”

Lêkolînvan Îbrahîm Îbrahîm di pirtûka xwe ya “Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn De” behsa jiyannameya Cegerxwîn a kesayetî, wêjeyî, nîrên civakî, aborî û siyasî yên ku beşdarî û bandora xwe di avakirina kesayetî û çanda wî de kirine, ligel pêwendiya di navbera helbest û dîrokê de dike. Herwiha li ber nakokiyên Kurdan di hemû qonaxên dîrokê de disekine û çend helbestên Cegerxwîn û bikaranîna bûyer û kesayetiyên dîrokî di van helbestan de şîrove dike.

Ev pirtûk ji 342 rûpelan pêk tê û li welatê Swêdê ji aliyê Weşanxaneya APECê ve hat çapkirin. Hoşeng Nîzar Nûh û Mihemed Zekî Mihemed ku wek Diljar Seyda tê naskirin lêhûrbûna pirtûkê kirine û bergê pirtûkê jî ji aliyê şêwekarê Kurd Luqman Ehmed ve hatiye çêkirin.

Fîlma kurdî “Rûmet” bo Festîvala “Cannes”ê hate hilbijartin

Fîlma Loran Medya Productionsê “Rûmet” bi derhêneriya Kamiran Bêtasi, di Festîvala Cannesê de ji bo “Beşê Kurtefîlman | Short Film Corner” hate hilbijartin.

Çêkera Fîlmê Rûmet û yek ji berpirsiyarên Loran Medyayê Narîn Nadîrovayê li ser hilbijartina fîlmê Rûmet ji Rûdawê re wiha got: “Ji bo me serfiraziyeke mezin e ku fîlmê me, li vê festîvala mezin û navdar bi zimanê kurdî were nîşandan. Emê hewl bidin bi du kesan li wir beşdar bin.”
Hêjayê gotinê ye ku Festivala Cannesê 8ê Gulanê destpê dike û heta 19ê Gulanê berdewam dike. Fîlm wê di wan rojan de di beşê kurtefîlman de û li ser înternetê jî ji mêvanên festîvalê bi şifreyeke taybet were nîşandan.

Salihê Kevirbirî yê ku ew jî berpirsiyarê Loran Medyayê û menejerê veberhênaniya fîlmê Rûmet e bi van hevokan behsa naveroka fîlm dike: “Fîlmê Rûmet behsa boyaxkarê pêlavan Findiyê 75 salî ku rengan ji hev dernaxe û zarokê bi navê Reşko dike ku li ber destê çayciyekî kar dike û di warê rengan de alîkariya Findiyê kal dike.”
Bûyer û mijara fîlm rast e, li Zaxoyê derbas dibe û jiyana kesên heyî di fîlm de hatiye nîşandan. Fîlm ji deh xulekan pêk tê.

www.arsivakurd.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

C) Ji aliyê peyvsaziyê ve hoker :

Wek me dîtibûn; piraniya wan peyv û qertafan, di hinek erkên xwe yên hevokî de dibin hoker.

Ev peyv û qertaf, li du beşên bingehîn parve dibin :

1. Hokerên xwerû(sade). 2. Hokerên hevedudanî(pêkhatî).
Qursên Kurdî, A. Karabax

41. Hokerên xwerû : Ev, ji yek bêjeyan pêk tên.
Mînak 521 : Ji hokerên xwerû çendek :
a. Ji nav û navdêran : Îro, duh, îşev, lez, nîvro, par, pêr, sibeh, zane.
b. Ji nav û rengdêran : Baş, bilind, kesk, mezin, rind, sax, xweş, zer.
c. Ji peyvên hokerî : Bêyî, hêdî, ku, na, par, pêr, zû.
ç. Ji yên çêkirî : Sibehê(sibeh+ê), baştir(baş+tir), zertirîn(zer+tirîn).

2. Hokerên hevedudanî : Ev herî kêm, ji du hêmanan pêk tên.
Mînak 522 : Bo pêkhatina hokerên hevedudanî, çend bikaranîn :

1. Ji yên bi bêjeyan çêdibin û bi hev ve tên nivîsandin :
Çavreş, çeperast, keskeşîn, rasterast, saxsax, serserî, xîzxîz, xurexur.
Hevok : a. Gulê xêz çeperast kişand. b. Azad, ji hespê de serserî kete erdê.

2. Ji yên bi ducarkirina bêjeyan çêdibin û cuda tên nivîsandin :
Hêdî hêdî, sar sar, teze teze, cot cot, deh deh, dilşikestî dilşikestî.
Hevok : a. Wan şîv sar sar xwarin. b. Zilam cot cot ketin hundirê malê.

3. Ji yên bi awayên tewandinê çêdibin :

Piştî nîvro, berê êvarê, sibehê zû, berî sê mehan.
Hevok : a. Dîlan piştî nîvro tê. b. Zavayê wan berî sê mehan li vir bû.

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

- Tiştîkê min e tişt e, ne wî ber e ne pişt e

Bi desta nahêt girtin, dunya hemî jê mişt e

Roj hebit naderkevit, çiray hilkey dê revt

Gelek yê şehrezaye, bi gişt cîhan dikevt

Zaroka qet nevên ew, ji wan ve dê ketin hew

Lê bi rastî we nîne, dema bêtin xoş e xew

Ew nîsk e yan kuncî ye, sih e yan jî tarî ye. (* Tarî) (38)

- Kalê pîr li civata Mîr. (* Semawer)

Du golê reş û hişîn, li ser bejna şan û şîn. (* Çav)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsiwakurd.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (324)

Wêneyên merasima bidawîhatina 229-mîn devreya destpêkî ya pêşmerge - çiyayên sînorî ên Kurdisatnê

www.arsivakurd.org